

Xwekujî dîsa bûye roje- va Kurdistanê!

»»» R:7



Navek pîroz “Pêşmerge”

Taliban, bask yan metir- siyeke din bo rejîma Îranê

»»» R:4

Guherîna demografiya Rojhilatê Kurdistanê

»»» R:5

*Bideştveanîna mafên netewî yên gelê kurd
di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

Agirî

Duheftînameyek Siyasî-Gîştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdi
www.agirimedia.org Hejmar (411) 07-12-2021 Buha (1000) Tûmen

Teqîna binkeyan an teqîna civakê

Piştî derbasbûna çend mehan ji paşxistin û xweparastin ji bersivdan bi peyama civatgeha cîhanê, tîma taybet a 40 kes a ser bi bandên “Wilayeta Feqîh”, ber bi Viyenê ve çûn heta ku bi qewla wan bo vêdebirina cezayan danûsitandinê bikin.

Rejîma Komara Îslamî herdem dixwaze ku çemik û destewajeyên gîştî û standard bigu-hire û bi navek din navê wan bîne da ku wisa bide xuya ku eva rejîma Îslamî ya Teh-ranê ye ku rêyan diyarî dike, û rola xwe bi ser bûyeran de disepîne! Di vê dewreyê de jî ku carek din civînek li ser dosiyeya navîkî ya rejîma Îranê hatiye lidarxistin, Xamineyî bo vê ku dibe xuya ji gotin û biriyarên xwe puşman nebûye, ew civîn bi civîna hilg-irtina cezayan binav kiriye.

Berê jî ku “Donald Trump” rêkevtina Bercamê hilûşandibû, Xamneyî digot, ku ne şer dê hebe û ne jî danûsitandin, lê niha çimkî di bin givaşa cîhanî de ye û Pas-darên wî di rewşek nebaş a aboriyê de ne, serê xwe bo danûstan-

dinan şûr kiriye û dixwaze bêje belê eva hemen ew danûstandin nîne, lê her danûstandinekê bikin û di bin her navekê de be divê tiştekê bidin û tiştekê din bistînin, îcar “Weliyê Fegîh” divê li derheq sitandina her tiştekê amadeyê danê be, hekî ne ew danûstandin ser nagire û dê qonaxek diwartir ji niha li dijî rejîma terorîstperwer a Kom-ara Îslamî deşt pê bike.

Di wê gerra nû a civînan de, û bi şandina tîma 40 kesî ji aliyê Xamineyî ve bi mebeştî qazanckirina dem û her bi wê cureya ku di medy-ayên cîhanî de belav bûye, aliyên Roja-vayî ji gotinên tîma Komara Îslamî bê hêvî ne û dibêjin ew pêşniyarên ku ji aliyê Komara Îslamî ve têne danê hemû bi merema rêknekevtinê hatine amadekirin.

Piştî belavbûna nûçeya serkevtînebûna deşt-pêka civînan û xuy-ankirina bêhêvîbûna Rojavayîyan di medi-yayan de, karlêkeriyek raserast li ser bazar û binkeyên Navkiya Îranê hebû.

Nirxa Dolar car din



di bazaran de bilind bû û Tumenê Îranê ji caran bê nirixtir bû, digel bilindbûba nirxa Dolar di rojekê de nirxa kelûpelan di bazarên Îranê de jî bilindtir bûn; Di rastî de berîkên xelkê hejar û kêmdahatên Îranê betaltir bûn, bi her pêngavekê Xamneyî û tîma wî, jiyana xelkê Îranê wêrantir kirine û givaşek zêdetir jî dikeve ser xelkê û ji hêla teqîna seranserî ve nizîktir dibin.

Her di vê demê de û digel tarîbûna hewa, dengê teqînekê bihêz derî û pencereyên malan ku bi dehan kîlômêtran ji binkeyên

“Netenz”ê dûr bûn hejand, mediyayên rejîmê û aliyên ser bi Spaha Pasdaran di vê derheqê de nûçeyên dijî hev belav kirin, xuya bû ku Spaha Pasdaran zêde tirsîya bû, û nedizanîn ku çi qewimiye, piştî der-basbûna rojekê ber-pirsên rejîmê li ser vê yekê rêkevtibûn ku bêjin ew dengê te-qînê ya mûşekên dijî balafiran di esman de bûye, lê ew yek rohn nekirin ku çima mûşek di esman de teqî, lê malên xelkê li ser erdê hejiyan.

Renge ew teqîn karê Îsrailê be, lê ji Cihgirê Wezîrê Berevaniya Îs-

raîlê pirsîn, got ez ni-karim bêjim ew teqîn çi bûye, xo li derheq karên şevane ji mêran pirsîyar nayê kirinê!

Ew dema ku Xamineyî got ne şer dê hebe û ne jî civîn û danûstanê bikin, hem rewşa aboriya Îranê têkçû, hem jî di binkeyên Navîkî yên rejîmê de berdewam teqîn û kavilkarî rû didin, di egera berdewambûna wê meşê yan dibe Xamineyî bi tevahî serê xwe bo zordariya Amerîkayê bitewîne, yan binkeyên leşkerî yên Rejîmê li pey hev bêne teqandin, yan jî renga civatgeh bi ser wan de biteqe.

Sergotar

Tabloyan
bişkînin

N: Kerîm Perwîzî

Kolonyalîzma hakim bi ser Îranê, roj bi roj givaşên zêdetir dixê ser netewên ku di Îranê de axa wan hatine dagîrkirin, û her rojê rûkê xwe yê dêw zêdetir derdixê.

Berpirsê Polîsê Tehranê di hevpeyvînekê de digel ragihandinan gotiye ku navên Kurdî, Tirkî, Lurî û ... bo dukan û cihên din li Tehranê qedexeyê. Berpirsê Polîsê Tehranê, Serheng "Nadir Muradî" di hevpeyvîna digel nûçegihaniya Mêhr de gotiye ku nabe navên Kurdî, Tirkî, Lurî, Şumalî û... li ser dukanan û cihên giştîyên Tehranê dabin. Herwisa gotiye ku bi destûra Wezareta Îrşad a rejîmê ew navane tenê di parêzgehên xwe de bibe bikaranîn. Herwisa wî berpirsê polis gotiye ew zimanane, zimanên navçeyî ne û nabe di Tehranê de bibe bikaranîn û divê her yek ji wan di cihê xwe de îzna danînê bi wan re pê bê dan!

Eva ku pêka gotina berpirsê Polîsê Tehranê, zimanên navçeyî ne! Tenê divê di cihên xwe de bo navên dukan û cihan mifahê jê bê wergirtin û xuya ye ku di derheq wan zimanan de xêrek gelek mezin kiriye! Çimkî bo mînak li Kurdistanê, rejîma Îranê rê nade ku ji zimanê Kurdî mifahê bê wergirtin û gelek caran ev qas pirs-girêkan bo xelkê diafirînin ku xelk ji danîna navên Kurdî puşman bibin.

Sîstema sepandî ya kolonyalîstî ku bi hêza çek, kuştin û terorê di sedeya derbasbûyî de ji Rizaxanê Pehlewî ve heta niha li ser wê cûgrafiayê zal bûye, hemû cure hewlekê bo jinavbirina netewan di Îranê de daye û xwes

Peyama Lêpirsiyarê Giştî yê PDKÎ bo roja kêmendamên di nav refa xebatê de



Lêpirsiyarê Giştî yê Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê "Mîstefa Hicrî", bo 16'ê Sermawezê Roja kêmendamên Hizba Demokrat, peyamek belav kir.

Deqa peyamê wiha ye:

Peyam bo roja kêmendamên di nav refên xebatê de

Roja 16'ê Sermawezê, ji aliyê Navenda Siyasî ya Hizba Demokrat ve wekî roja rêzgirtin ji xebat û cangoriya kêmendamên şoreşê hatiye diyarîkirin. Di wê rojê de û li sala 1366'an a Rojî, fermanê zîrek û netirsê Hêza Pêşmerge, mamosta "Hesen Şêweselî" di kiriyarek terorîstî ya dujminê gel de beşek ji endamê cêsteyê xwe ji dest da.

Di refa xebat û têkoşîna gelê Kurd de, bi sedan kes bi awayek cangorî beşek ji cêsteyên xwe pêşkêş meşa xebat û têkoşanê kirine û her lewma di wiha rojekê de hewce ye rêz ji cangorî, qehrimanî û xwebexşkirina wan têkoşeran bê girtin û digel heştkirin bi êşa wan cêsteyan, şanaziyê bi hebûn û bexşendeyiya wan bikin.

Em silav û rêz û wefa bo hemû wan bexşendeyane dişînin ku giranbihatirîn sermaye ne ku beşek ji cêsteyên xwe pêşkêş rêya xebat û têkoşana rizgariya gel û nîştimana Kurdistanê kirine.

Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê

Lêpirsiyarê Giştî

Mîstefa Hicrî

16'ê Sermawezê 1400'an a Rojî

7'ê Kanûna Pêşîn a 2021'an

tine tenê zimanê Farsî bimîne û tevahiya zimanan û netewên din reş bike û ji nav bibe.

Ew gotina ku ji devê wî berpirsê polîsê Îranê re derketiye, beşek biçûk ji wê siyaseta şovenîstî û kolonyalîstî ye ku bo helandina netewan bi rê ve dibin.

Di hember wê siyaseta rejîma Tehranê de hewce ye, netewên zulimdîtî bertekan nîşan bidin û li dijî rawestin. Niha ku rejîma Îranê bi wê şewazê û li tabloyên dukanan û cihên giştî de ji cudatîdanî û şowenîzmê rêwiyê dike, ya baş ev e ku netewên di bin zilman de li hember de rê nedin ku tabloyên bi zimanê Farsî di nîştimana wan de hebin.

Dema ku rejîm biryarê dide ku navên Kurdî, Tirkî di bajarê Tehranê û bajarên Farsnişîn de qedexeyê bike, baştirîn helwest û berteknîşandan ji aliyê netewan ve, ev e ku ew jî di deverên xwe de û li ser axa xwe navên Farsî bo dukan, cihên giştî û tabloyan qedexeyê bikin. Baştir wisa ye ku kempêna "ciwanên xwedîhelwest" bê lidarxistin û tevahiya tabloyên Farsî li ser axa netewên zulimlêkirî di Îranê de bişkînin.

Navek pîroz “Pêşmerge”



N: Nûredîn Sofizade

Herwekî hemî aliyek agehdar e, bi dirêjiya dîrokê xebata gelê me bona bideşt-veanîna mafê netewî û rizgariya axa Kurdistanê di bin deştê hikûmetên dagîrkar de berdewam bûye, û di wê xebat û berxwedanê de jî xortên xwedî heşt û bixîret ên Kurd weke şoreşvan her fidakariyek kirine û mirov dikare bi netirsî ve bêje ger ev şoreşvan nebana, egera jinavçûn û heliyana bi yekcarî ya netewa me bi du ve baba, herwekî em dizanin zaf netewe bi dirêjiya dîrokê ji nav çûne û nemane û heta navê wan jî nemaye.

Ku wisa ye gelê Kurd û Kurdistan minetdar û qerdarê xortên xwe yên şoreşvan e û bê guman hemî Kurdek gelek baş vê yekê dizane ku hekî fidakarî û ked û gernasîya şoreşvanên Kurd nebaya li hember êrîş û pîlan û siyaseta asmîlasona ku dijminan li ser gelê me bi rê ve birinî, rege qedera Kurdan jî wekî ya zaf netewên dinê baya.

Şoreşvanên Kurd ku sedema sereke ya man û mewcûdiyeta Kurd û Kurdistanê ne, tenê mirovên lêqewmî û qaçax û yaxî ji deştê kêşên xwe yên şexsî nînin, belkî ew şoreşvan li pêxema bideşt-veanîna maf û azadiya neteweyekê de serî hildane.

Wan deşt ji her xweşî û xev û xwarineke xweş û asûde û jiyana digel malbat û kesûkarê xwe kêşane, da ku netewa wan ji bin deştiye xelas bibe, axa nîştmana wan ku Kurdistan e ji deştê dagîrkeran rizgar bibe, wan sîngê xwe kirine mertala paraştina Kurd û Kurdistanê ku dijmin nekarin wan tune bikin.

Şoreşvanê Kurd amade ye ku riha xwe di wê rêkê de dabi-



nê, dema ku xortek şoreşvan serî hilda û amade bû ku xwe bimire da ku netewa wî/wê nemire û mergê xwe pêş mergê gelê xwe dabînê, baştirîn nav ku pir wate ye û gorî hemî sîfetên bilind û şoreşvaniya xortê Kurd e, navê “PÊŞMERGE” ye.

Renge di heyamê sedan salên borî de gelek kesan li hember zîlm û zordariya ser xwe, serî hildabe û berxwedan û şer kiribe, ji aliyê xelkê ve rege navê cur bi cur li ser wan serîhildayîyan hatibe danîn, lê di xebata berheq a gelê me de û bi taybet li sed sala 20an de, digel bilindbûna asta hişyariya netewî û bi-hêzbûna nasyonalîzma Kurd bona çekirina dewlet-netewe, û modernbûna xebatê û dema pirsê netewa Kurd bû pîrsek siyasî, serhilderên Kurd jî êdî dibîne serhilderên bi nûneratiya netewa Kurd.

Dema ku di sala 1945an de ji aliyê PDKÎ ve gorî derfeta hatî pêş li parek ji axa Kurdistanê de, Komarek û avakirina dewlet û deshîlata Kurdî têtê ragihandin, di wê demê de erkê parêzgarî ji wê deştkevtê ku dikeve ser milê xortên welatparêz ên Kurd, her ew xortanene ku wê Artêşa nîştimanî rolê paraştin ji Komara Kurdistanê dikêşne stuyê xwe, lewma mijara navlêkirina wan xortên parêzerên Kurd û Kurdistanê dikeve ber basa deshîlatdarên Komarê, ku wê demê ye navê pir wate û pîroz ê “PÊŞMERGE” bo wan têtê diyarîkirin.

Ger hekî em di salvegera diyarîkirina nevê Pêşmerge de, wê yad û bonê pîroz dîkin û Pêşmerge bi bîr tînin, bi wê wateyê nîne ku tenê salê carekê pêşmerge têtê bîra me û rêzê lê digrin, di rastî de em wê rojê an ku 26ê Sermawezê yadê wan kesan digrin û wan bibîr tînin ku navê Pêşmerge wekî yadigar û navek pîrwate bo gelê Kurd piştî xwe bicî hêlane, hekî ne kîjan roj di salê de heye ku em şahidê berxwedanî û xweşmêrî û daştanrêsiya Pêşmerge nebin?

Kîşan roj û dem û demjimêr heye ku xwîna Pêşmerge bona paraştina Kurd û Kurdistan, nerijyabe ser axa me? Ku wisa ye hemî dem û gav û rojek, dema rêzgirtin ji pêşmerge ye û lewma ye ku her demê Pêşmerge sembola gelê xwe ye û navê pîroz ê Pêşmerge remza serbilindiya netewa Kurd e.

Ger mixabin temenê Komara Kurdistanê gelek nebû, lê heya îro rojê jî navê Pêşmerge, wekî yadigar û medaliya Komarê û dewleta Kurdî, ji aliyê xortên şoreşvan ên Kurd ve her hatiye rakirin û paraştin û wekî pîrwatetirîn nav bo xortên serhilder û şoreşvanê Kurd naha jî têtê bikaranîn. Gelek caran dijminan cehd kirine ku navê Pêşmerge xirab bikin, lê ew nave bal gelê Kurd îro rojê wekî pîroztirîn nav têtê mêzekirin.

Navê Pêşmerge li hemî cîhanê deng vedaye, û



pêşmerge wekî parêzerê mirovahiyê, parêzerê ax û gelê xwe, parêzerê keramet û serweriyê hatiye naskirin. Kêm roj heye ku xortên egît û şoreşvanên Kurd bi şanazî ve li kincê pêşmerge de û bi navê Pêşmerge, tenê li pêxema paraştina Kurd û Kurdistanê ber bi mirinê ve neçin. Axa Kurdistanê bi xwîna sor a Pêşmerge hatiye xemilandin, Pêşmerge bi mergê xwe pêşî ji mergê gelê xwe girtiye, eva pêşmerge ye ku heya îro rojê nehêlaye dijminên Kurd û Kurdistanê bigîjne xewna xwe ya tunekirina Kurdan.

Dema em jî basê Pêşmerge dîkin, wekî Kurd, wekî Kurd li Rojhilatê Kurdistanê, wekî endam û pêşmerge PDKÎ ku avakerê Komara Kurdistanê û danerê navê Pîroz ê Pêşmerge li ser şoreşvanê Kurd, mirov çend qat zêdetir şanaziyê dike.

Pêşmergayetî erke pîroz û netewî ye û berpirsayeriyeke mezin dêxe ser milê wan kes û şoreşvanan ku amade ne bibîne “Pêş, Mergê” gelê xwe, hevdem Pêşmerge cem gelê xwe bûye remz û sembol û hezkirî.

Ger dizanim rojekê dê her bimrim, çima tenê bo xwe bimrim?

Çima bo neteweyekê nemrim?

Çima mezin nemrim û nebime keç û kurê milletê Kurd?

“Taliban”, bask yan metirsiyeke din bo rejîma Îranê



N: Serbest Urmîye

Piştî ku di çend mehên borî de bizava “Taliban”ê bi terzeke ecahîbgirtî ji nû ve dest avête bizaveke berfireh bo dagîrkirina Efxaniştanê û paşvekeşiyana Arteş û karbideştên dewleta Efxaniştanê û ji hemûyan ecêbtir paşvereviyana Arteşa DYE`ê û bicihhêlana hemû alav û îmkanatên xwe yên leşkerî bo “Taliban”ê, û rejîma Îranê rastî çend hevkêşeyan di warê siyasî û leşkerî de hatiye. Di dema destpêkirina êrîşên nû yên bizava “Taliban”ê ji bo dagîrkirina careke din a Efxaniştanê, berdevkê wê bizavê di konferanseke ragihandinê de eşkere kir ku ew berê bi rejîma Îran û Rûsiyayê re lihev hatine. Renge ya ku heya vir ji diyayê re cihê gumanê têrmanê bû, ji rejîma Îranê pêvajoyeke pîlandarêti bû. Eva di demekê de bû ku tîkiliyên nepenî yên Îran û “Taliban”ê jî êdî hatibûne eşkerekirin.

Lê piştî serkevtina “Taliban”ê hevkêşeyên herêmî û hin hevkêşeyên cihanî jî guherîn. Di vê navberê de aliyê kêm helwestên cihanî bûn du tayên hevterîb. Aliyek li hember damezrandina dewleta mesebî ya “Taliban”ê û aliyê din jî hogirê wê bizavê bûn û îlan dikirin ku divêt di rêya bifermbînasîna dewleta “Taliban”ê de hewil bidin ku dewleta han li gor pîvan û pêwerên cihanî ava bibe. Yanî bikarin dewleta “Taliban”ê teslîmê îrade û raya cihanî ya dewletdariya modern bikin.

Di rewşeke wiha de rejîma Îranê dikeve navbera du lêgerên li dijî hev. Ji ber ku him ji aliyê îdolojîyên mesebî ve yên ku rejîma Îranî û “Taliban” dişopînin cudahî û dijhevî hene û him jî hevsînorbûn bi bizaveke pir



alozi û serberedayî ya ku hêj tevî çî pîvereke cihanî xwe pênase nake, dikare lêgerêke cidî be bo rejîma Îranê. Lêgereke din ku di vir de ber bi rûyê rejîma Îranê be û ji mêj ve ye rejîm di hewlê de ye bi qazancê xwe mifahê jê werigire, dijberiya kevnar a di navbera Amerîka û “Taliban”ê de bû. Rejîma Îranê bi hebûna ezmûna alîgirî û piştevaniyê li taqîmê tundaço di tevlihevîkirina tenahiya herêmê de û bikaranîna wan di şerê bi wekalet li dijî Amerîkayê, hewil da ku di hegera serhildana şer û êrîşa DYE`ê bo ser Îranê, ji bizava “Taliban”ê weke baskeke xwe yê din di çeperê rojhilatê Îranê de mifahê wergire. Lewma herî zû tîkiliyên xwe bizava han re eşkere kirin û bi şandina şandeyên siyasî yên xwe li ser navê hewildan ji bo pêkanîna dewleteke tevalî di Efxaniştana di bin desthilata “Taliban”ê de, ketin bizaveke cidî.

Aliyeke din di vê derheqê de ku vê hizirê li cem berpirsiyarên rejîma Îranê bihêztir dike ku hewil bide ji “Taliban”ê weke baskê rojhilatê xwe mifahê werbigire, ragihandina tîkiliyên her du dewletên Çîn û Rûsiyayê bûn bi “Taliban”ê re. Ev jî bi vê hizirê ku her du dewletên navhatî, di dijberiyê dijwar a hizirî, siyasî, bazerganî, teknolojiya leşkerî û ... de ne tevî DYE`ê. Lewma ku du hêzên han, nemaze Çîn di herêmê li dijî berjewendiyên DYE`ê ye, dikare xaleke erênî bo rejîma Îranê jî be ku bi piştevaniya “Taliban”ê li hember Amerîkayê bisekîne. Heya vir beşek ji pirsê bû. Beşa din ya ku rejîma Îranê ber bi rûyê lêgereke cidîtir

dike, metirsiya paşerojê ye ku bizava “Taliban”ê dikare bo ser rejîmê hebe. Ev jî ji ber hebûna hin hevkêşeyan e ku di rojeva navbera rejîma Îranê û “Taliban”ê de hene. Hebûna dijheviya hizirî di hizra mesebî de, hebûna hin aloziyên kevin di navbera “Taliban” û rejîma Îranê de ku heya niha jî gellek caran bas jê tê kirin. Alîkariya rejîma Îranê bi Amerîkayê re di dema êrîşa piştî bûyera 11`ê Septembarê ya 2001`na a Zayînî bo ser “Taliban”ê ku bo sedemê hilûşîna desthilata wê demê ya “Taliban”ê di Efxaniştanê de. Herwiha kuştina diplomatên rejîma Îranê bi destê “Taliban”ê û ...hwd, ev pirsgerêkin ku hêsta nikarin hevalbendiya her du aliyan garantî bike.

Hevsînorbûn û hebûna sînorek dirêj di navbera Îran û Efxaniştana pir ji alozi ya di bin desthilata “Taliban”ê de jî dikare metirsiyeke din ber bi rûyê rejîma Îranê bike. Di vir de jî ya herî xuya eva ye ku li gor raporên cihanî dewleta hilûşiyayî ya Xelafeta Îslamî (DAIŞ) paremayiyên hêzên xwe di Efxaniştanê de kom dike. Bi liberçavgiirtina îdiayên rejîma Îranê di şikandina (DAIŞ)`ê di Iraq û Sûriyê de, hebûna hêzên (DAIŞ) di aliyê rojhilatê Îranê de, ev jî bi hebûna sînoren ku him ji ber qaçaxa madeyên hişber û him jî bi hebûna dewleteke bi tevahî cihnegirtî di Efxaniştanê de, dikare hegera êrîşa DAIŞ`ê bo ser Îranê bihêz bike. Serbarê vê çendê ku bi reviyana DYE`ê qaseke zêde û berçav ji kereşeyên modern yên leşkerî û top û tankên şer ketin destê “Taliban”ê, lê aliyê aborî di vir de dikare hevkêşeyan

destnîşan bike. “Taliban”ê weke xuya dike di rewşeke aborî ya lawaz de ye û herwiha aboriya rejîma Îranê ji ber dorpêçên cihanê, di astê herifên de ye. Ev yek dikare lêgereke din be ku di paşerojê de “Taliban”ê ber bi aliyên rojavayî yan DYE`ê rakişîne. Di vê demê de texmîn tê kirin ku di hegre serhildana şer li dijî Îranê de, “Taliban”ê hem ji aliyê Amerîka û hevalbendên wê ve li dijî Îranê têkeve şer, him jî ji derfetê mifahê wergire hesabên kevin tevî Îranê safî bike.

Ya ku metirsiyên “Taliban”ê ku me bas kirin bo ser Îranê bihêztir dike, hebûna alîgirên hizra dewletdariya mesebî “Taliban”ê ye di Îranê de. Ya ku hat dîtin bizava mesebî ya sunî ye ku bi xasmanî di rojhilatê Îranê û di kêleka Efxaniştana di bin desthilata “Taliban”ê de bihêz e. Axavtinên çend mehên borî yên “Molana Ebdulhemîd” Serokê Bizava mesebî ya Sunî li parêzgeha Sîstan û Belûçîstanê ye ku bi eşkere dawxazê ji Îranê û welatên cihanê, nemaze welatên Îslamî dike ku hewce ye peyrewiyê ji sîstema dewletdariya Îslamî ya “Taliban”ê bikin. Serbarê vê hindê ku bizavên rizgarîxwazî yên li dijî rejîmê jî li Sîstan û Belûçîstanê de xwedî pêgeh in û nabe berçav nehên girtin. Rejîma Îranê jî bê guman heşt bi van metirsî û gefên han dike, lewma hewil dide ku car li hember raştiyan de xwe nerim nîşan bide û heta ji hin mafên xwe yên herêmî û navneteweyî jî di vê navberê de derbas bibe. Lewma ye ku serbarê aloziyên tund yên ser sînor, rejîm hewla peçavtina wan dide. Weke mînak, hewil dide êrîşa “Taliban”ê ya çend rojên borî ku tê de “Taliban”ê derbasî nava axa Îranê bû û hin bingeşên leşkerî yên rejîmê jî dagîr kir, lê rejîmê nehişt dengvedaneke wisa jê çêbe û tenê ragihand ku şaşıtiyek di ortê de hebûye û her du aliyan ji şaşıtiyê fêm kirine û pirsgerêk çareser bûye.

Guherîna demografiya Rojhilatê Kurdistanê



N: Dara Natiq

Rojhilatê Kurdistanê bi giştî ji çar parêzgehên Urmiye, Sine, Kirmaşan, Îlamê pêk tê ku piştî Bakurê Kurdistanê parçeya herî mezin a axa Kurdistanê pêk tîne. Lê li gor parvekirina dewleta navenidiya Îranê, rejîma dagîrker a bi nav Komara Îslamî a Îranê tenê parêzgeha Sine weke Kurdistan daye binavkirin. Rûberê hemû axa Rojhilatê Kurdistanê zêdetir ji 175.000 KM çar goşe ye. Av û hewayê Rojhilatê Kurdistanê li herêmên çiyayî ji ber berfa giran, sar û li herêmên deştayî jî Havîna gerim û Zivîstan jî zêde ne sar in. Rojhilatê Kurdistanê xwediyê çavkaniyên herî dewlemend yên weke av, neft, gaz û zêr û xwezayek rind û bi bereket e. Cugrafiya Rojhilatê Kurdistanê girêdayê sînorên çend dewletan e û herçar parçeyên Kurdistanê li hev girê dide û xudiyê derwazeyên gumrekî û bazerganî yên mezin e di navera dewletên herêmî û cîhana pêşketî de.

Lê mixabin bi dirêjahiya dîrokê, dagîrkerên Kurdistanê hertim cehd û xebat kirine ku demografiya vê herêma herî dewlemend û xwedî bandor a Rojhilatê Kurdistanê bi taybetî li bajarên Urmiye û Kirmaşan û derdorên wê biguherin û nasnamaya Kurdistanî û neteweyî ya wan deveran jê biştînin û li Kurdistanîbûnê wunda bikin. Di serdemê rejîma paşayeti de bi hezaran Kurd li bajarê Makû, Xoy, Selmas, Urmiye û bajarên din, bi zorî û zor-darî bo parêzgeha Xurasan û parêzgehên din yên Îranê hatin koçandin û deşt bi ser mal û milkê wan de hate girtin û li şûna wan azerî û xelkên ne Kurd hatin akincîkirin û hemî hewla xwe dan ku pêkhat-eya heşîmetî a akinciyên wê



deverê biguherin û Kurdan li vir derbixin. Piştî hatina serkar a rejîma dagîrker a Xumeynî jî siyaseta guherîna demografiya Kurdistanê û bixasma li devera Urmiyê heta vê gavê jî bi awayek sîstematîk û pîlandarî herwisan berdewam û dimeşe.

Li ber girîngî û taybetmendi-yên siyasî, olî û xwezayî û çavkaniyên dewlemend yên binerd yên parêzgeha Urmiyê, dagîrkerên Kurdistanê hesasiyetek zêde nîşan didin û berdewam hewil didin ku nasnameya Kurdî û Kurdistanî ya wê herêmê biguherin.

Urmiye navenda serhildanên siyasî ye û cihê Urmiyê di doza siyasiya Kurdistanê de taybetî ye. Heya niha bi qasî ku dîroknivîsên Îran û Kurd deştî nîşan dikin Kurdan li Urmiyê serhiladên jêr pêk anîne: Serhildana Emîrxanê Lepzêrî an jî serhildana kela Dim-Dim, serhildana Şêx Ubeydullahê Nehrî, Serhildana Simkoyê Şîkak û serhildana eşîreta Celalî li Makûyê. Di van dused salên derbasbûyî de ku Kurdan ji bo çekirina kiyaneke serbixwe gelek xebat û serhildan pêkanîne, Urmiye jî di dîroka serhildanên Rojhilatê Kurdistanê de xwedî cihek stratejîk e. Urmiye zadgeha Zerdest û navendek olî ye

û piraniya dîroknivîs û co-grafîzanên Îranî û Erebiyên serdema piştî hatina Îslamê (Ibn-i-Hewqel, Hemdullah Mustewfî, Yaqût-i-Hemewî û hwd), cihê jidayikbûna hezretê Zerdest, bajarê Urmiyê bi nav dikin. Herwiha Urmiye di çaxê deştîlatdariya “Partîyan û Sasanîyan” de ziyartegeha Zerdestîyan bûye. Hemû deverên herêmê ji ber rengîniya sirûştê xwe mîna seyrangeh û cihê geriyana xelkê ne. Gundê Bendê li rojawayê Urmiyê, herêma Mirgewer, Tirgewer û Soma û Biradoşt, seyrangehên herêmê yên naskirî ne.

Hemî ew taybetmendî û gelek taybetmendiyan din wisa kiriye ku dagîrker û neyarên Kurdan çavê temayê birine axa Rojhilatê û bi hemî awayî dixwazin cuxrafiya wan deveran biguherin û kesên ne Kurd li vir akincî bikin. Rejîm di zêdetir ji çil salên deşîlatiya xwe de berdewam bi siyaseta qirkirina Kurdan, qedexekirina çand û kultura Kurdan, koçandina bi zorî a Kurdan, perawêzxiştina Kurdan li kar û barê îdarî û rêveberiya herêmên xwe, komkujî û tepeserkirin, talanbirina çavkaniyên Kurdistanê weke av û neft û gaz û..., serkut û tepeserî û pîlan û siyaseta guherîna heşîmeta Kurdistanê, hertim xwaştîye ku sîma û nanameya neteweyî ya Kurdistanê biguhere. Di

çend salên derbasbûyî de û bi taybetî şovenîstên Azerî yên girêdayê damûdezgehên emniyetî yên rejîmê bi harîkarî û piştgîriya Spaha Pasdaran a terorîst û li çarçoveya pîlan û stratejiya biyom a wê rejîmê, bi awayek berçav tev nav û taboyên Kurdî yên ser dukan û kolanan guherîne û navên Azerî û biyanî li ser van nivîsandine. Herwisan bi awayekî berçav mijûlê kirîna erd û zeviyên Kurdan e û Kurdan neçar dikin ku mal û milkên xwe bi awayekî erzan û mifte bifiroşne azerî û xelkê bajarên weke Îsfahan û Tehranê.

Rejîm cuda ji talanbirina av û çavkaniyên Kurdistanê bi awayek sîstematîk xelkê bajarê Farsnîşîn vediguheze bo parêzgeha Urmiyê û Sineyê û Kurdan neçar dîke ku zevî û milkên xwe bi erzanî bifiroşine wan û Kurdan neçar dikin ku warê xwe çol bikin. Bê şik hemî ew siyaseta han ya qirêj bi merema guherîna demografiya Rojhilatê Kurdistanê ye û dibe Kurdên me hişyar bin û bi vê siyaseta han ya rejîmê nehêne xapandin û mal û milk û axa bav û kalên xwe ku bi xwîn û keda xwe parastine û nehêlane dagîrkerên Kurdistanê nasnameya Kurdî ji wan biştînin, erzanfiroş nekin. Dibe li axa bav û kalên xwe xwedî derkevin û berpeça pîlanên rejîmê bidin.

Jeopolîtîk û curên wê (Beşa 2)



N: Behzad Qadiri

W: Behzad Simko

Jeopolîtîka rexnegirane

Çemka jeopolîtîka rexnegirane di hemberî jeopolîtîka kilasîk de hatiye pêşkêşkirin; Di jeopolîtîka rexnegirane de jeopolîtîka kilasîk bi vê yekê tê rexnekirin ku mifahvergirtina hêzên kolonyalîstî ji hizrên cugrafîyayî hêsan kiriye. Peydabûna dîtingeha rexnegirane li jeopolîtîkê, vedigere bo dehika 1960an a Zayînî; dema xebata pêwendîdar bi mafê medenî û dijayetî digel şerê Vîyetnamê û herwisa piştvanî li xebata xelkê Elceyayirê li dijî Feransê li welatên Birîtaniya, Amerîka û Ferana hatine gorê.

Di jeopolîtîka rexnegirane de, bal bo aliyê vê pîrsê tê kêşandin ku çawa siyaseta bi rêya rewşenbîran û ekterên hikûmeta desthilatdar, qeware bo cîhana siyaseta danîne û siyaseta cîhanî afirandine. Jeopolîtîka rexnegirane ji siyaseta berê û rola zanişt-hêz bo hêskirina dagîrkeriyê û pêgeha derzkirinê bo zilhezana, rexne digre.

Jeopolîtîka berevanî

Yek ji çemkên nû ên jeopolîtîkê, çemka jeopolîtîka berevaniyê ye, di jeopolîtîka kilasîk de hêz, qazancên siyasî, aborî û çandî li ser pêgeha helwêst û daxwazên dewletan û desthilatdaran dihatine darêstin û bi rê ve diçûn. Herwisa jeopolîtîka kilasîk rewatî bi rola dewletan, hêzan û desthilatdaran daye û ev di halekê de ye ku rola qat û texên civakê û netewên bin dest û herwisa rola kêmineyan û qewiyetan ku mijûlê berevanî ji xwe li hember dagîrkerî û îrade û



xwestên dewletan bûne, nedihate berçavgirtin.

Bi dîtingeha “Pawil Rotlêc” hin rewşên ku di navxweyê civakan de dest bi ser Artêş, siyaseta, çand û aboriya dewlet û qata desthildarê de dikêşe nav çalîşê, jeopolîtîka ji xwarê ve tê binavkirin. Ew jeopolîtîka bas ji berevaniya qatên jêr dest li hember desthilatdar û zêdexwaziyên qata desthilatdar û dewletan di warê navxweyî de dike.

Jeopolîtîka berevanî yan bi wateya ku Rotlêc daye nasandinê, li dijî jeopolîtîk an jeopolîtîka ji xwarê, ji hêza çandî, siyasî û exlaq a civaka medenî pêk hatiye ku bawerî bi vekheviya berjewendiyên qata siyasiya desthilatdarê dewletê digel berjewendiya giştî dikêşe nav çalîşê. Ew vizeye li qalibên binke û rêkxirawên nahikûmî yê wek rêkxirawên Olî, ragihandin, rêkxirawên xwebexş, perwerde, yekîtiyên bazirganiyê û ... hwd dixebitin û hêza madî (leşkerî û aborî) ya dewletan û rêkxirawên cîhanî dixin nav çalîşê.

jeostratejî

Jeostratejî pêk hatiye ji zaniştê nasîn, vergirtin, mifahvergirtin û parastina çavkaniyên cugrafîyên hêz bi dîtingeh û tekezî li ser binyata leşkerî-

berevanî ji boneyên netewî, deverî û cîhanî. Bi wateyek din, rol û karlêkeriyên cugrafîyayê di darêstin û bin kiriyarkirina stratejiya leşkerî û aborî, pê re jeostratejî tê gotin.

Jeoekonomîk

Zanişt a çemka jeoekonomîk di navbera salên 1990an heta sala 1993an ji aliyê aborînas û şewirmendê Amerîkayê “Edward Lotwak” ve hate nav cîhana wêjeya jeografiya siyasî. Dîtingeha jeoekonomîk pêk hatiye ji xwendîna karlêkeriya sedeman an jêrxanên aborî li welat, dever û cîhanê li ser biryarên siyasî û rikeberiya hêzan; bi wateyek din bi rola sedemên cur bi cur ên aborî (çavkaniyên jîngehî wekî av, ax, çavkaniyên fosîlî, kangeh, rêyên pêwendî û bazirganiyê) di biryarên siyasî de bi pîverên cuda ên netewî, deverî û cîhanî, jeoekonomîk jê re tê gotin.

Piştî şerê cîhanî yê 2ê û rikeberiya du zilhezên serkevtî yê şer an ku Amerîka û welatê Soviyetê li warê leşkerî û siyasî, çend hêzên din bi dîtingeha aborî û jeoekonomîk hatine nav meydana rikaberîya cîhanê, di nav wan hêzan de welatê Japonya û Alman ku di raştîyê de şikestxwariyên binge-

hîn ên şerê cîhanî bûn, bi hînbûn ji stratejiyên leşkerî û siyasîyên xwe yê berê, bi dîtingehêk jeoekonomîkî dest bi nûjenkirina welatê xwe kirin û kêmtir ji 2 dehikan li cîhanê bûn bi cemserên mezin ên aborî.

Hîdropolîtîk

Hîdropolîtîk ji beşên binge-hîn ên zaniştê cugrafîya siyasî ye ku li derheq rola av di danûstandinên siyasî de bi pîverên cur bi cur lê dikole û cura rikeberîya di navbera netewan de bi mifahvergirtin ji çavkaniyên avên hevpar, gelek ji livehkirinan û hevkarîyên tevav heta li hevnekirinan û şer li xwe digre. Bi balkêşandin li ser mifahvergirtin ji wan çavkaniyan, şahidê zêdebûna danûstandinên hîdropolîtîk di navbera welatan de dibin; bi şewazek sadetir, bi gengeşekirina rol û karlêkeriya çavkaniyên avê di biryarên siyasî de û li rikeberiyên di navbera welatan an deveran, hîdropolîtîk tê gotin.

Îro, ew welatên ku di rewşeke baştir ya hebûna çavkaniyên avê di beranber welatên dinê de ne, hêzek zêdetir hene û di karûbarên siyasî û rikeberîyan de, ji avê wekî kartek karlêker û bi bandor, mifahê jê verdigrin.

Nerîna Lîderan



“Maria Adebhar”:

“Me lêkolîn li ser pêşniyarên Îranê ên danûstandinên Navikî kirine, cihê qebûlkirinê nînin”.



“Benjamin Netanyahu”:

“Îsraîl divê bi bêtî Amerîkayê, amadeyê rawestan li dijî bernameya navkiya rejîma Îranê hebe”.



“Sînem Mihemed”:

“Me gefên Tirkîyê yên li ser Rojava-yê gihande Amerîkayê”.



“Îbrahî Reîsî”:

“Em raştî kêmiya micid a bûdceyê hatine”.

Xwekujî dîsa bûye rojeva Kurdiştanê!



N: Eskender Ceiferî

Keçeke evîndar, jineke azadîxwaz û jineke mafxwaz qet nikare li Kurdiştanê di bin siya rejîma faşîstên Tehranê de ku Îslamî ye, bibe xwedî maf.

Di rojên derbasbûyî de dîsa li Kurdiştanê çendîn keç û jinan dawî li jiyana xwe anîn. Çend mînakên ji bajarên wek Urmiye û Sine, nimûneyên xembar ên vî diyardeyê bûn.

Li gor ku çalakvanên sîvîl didin zanîn, rêjeya salane ya xwekujiyê li wir ne kêmtirî rêjeya salane ya darvekirinê ye. Piraniya wan kesên ku xwe dikujin jî, jin in.

Xwekujî, kiryarek e ku mirov bixwe tê de biryarê dide dawiyê li jiyana xwe bîne. Mirov dikare bêje sedema sereke ya vî kiryarê li hemû civakan bêhêvîbûn e. Xwekuj, ji her çandekê bi her zimanekî û ji her neteweyekê be, digihe astekê ku li gor wî/wê neman jê re bi mifahtir e jî jiyane.

Li gora zanyariyên çalakvanên Kurd, piraniya wan xwekujîyan ji ber sedemên weke namûs, abûrî, tûşbûna bi madeyên hişber û ji ber pirsgerêkên malbatê ye.

Eger kerameta mirovan ji hikûmetan re girîngtir be, divê kesekî sîvîl nekare bi hêsanî çek û sîlahan bi deşt bixîne. Hebûna çek û sîlahan di civakekê de dikare fikra tundrew li pey xwe ve bîne. Eger salane 200 welatîyên Kurd ji aliyê wezareta Dadê ya rejîmê ve tenê darvekirin, zêdetirî 500 kesên jî dawiyê li jiyana xwe tînin.

Hebûna hebên naskirî bi



Birinc û Siyanor jî dikare rê li ber xwekujiyê veke. Ew kîjan dermangeh e ku li Îranê, bêtî biryara pizîşkan, heban nefuroşe!

Salane 800 hezar kes heta milyonek kesên li hemû cîhanê bi şewazên cûrbicûr dawiyê li jiyana xwe tînin.

Rêkar û rênimûniyên ayînî, dema ku tevî siyasîyê dibin, fikra mirovan jî diguherin. Li gor ola Îbrahîm, jiyana tiştêk pîroz e lê xwekujî jî gelek mezmûm nîn e. Japonî jî xwekujiyê weke qerebûya pêşîneya xirab dibînin. Li Hindîstanê jî jina ku zilamê wê dîmir, dikarî xwe bavêje ser agirê ku laşê zilamê pê dişewtînin da ku ew jî dawiyê li jiyana xwe bîne.

Li gelek ji welatên Rojava, êdî xwekujî yan hewla xwekujiyê weke Tawan nayê hejmarkirin. Lê belê divê ji bîr nekin ku hêviyên jiyana xelkê li welatên Rojava eger gelek ji baş nebe, lê hêjayî kerameta mirovan e.

Li hin welatan şewazeke xwekujiyê bi navê Xwekujîya Alîkar heye. Hin çalakvan dibêjin hikûmeta Îranê jî bi kiryarên xwe ên abûrî û siyasî bûye alîkariya xwekujîya qurbanîyan dike.

Hin siyasîyên Îranê pêşniyarê dikin ku termê wan kesên ku xwekujiyê dikin, di qebriştanên gund û bajaran de neyên binaxkirin. Lê belê wan jî bîr kiriye ku divê çavkaniya xwekujiyê bêtî hişkkirin.

Mentiqa wan kesên Atêna berê ya Yonanê ye ku kesên bêtî erêkirina hikûmetê dawiyê li jiyana xwe tînin,

ji binaxkirina di goriştan de dihatin bêtî parkirin û bêtî navûnîşan li dervey goriştan dihatin binaxkirin. Dibe ku ew kiryar jî bikarin meyl û heza xelkê ji bo xwekujiyê kêmtî bikin. Lê dîsa jî nabe hikûmet ewqasî xemsar be ku li dewsa zuhakirina çavkaniyê, qurbanîyan weke tawanbar bide nasandin yan jî piştî xwekujiyê, hikûmet deşt danî ser milk û malên wî/wê.

Deştîlata ku herî zêde bi şeweyek radîkal li hemberî vî mijarê derdiket, Berîtanya di sedsalên 19'an de bû. Eger li ser kesekî/ê bihata îsbatkirin ku hewla xwekujiyê daye, ew kes dihatê darvekirin. Mentiqa deştîlatdarên wê demê ên Berîtanya ji bo îdamkirina kesên ku deştî davêjin xwekujiyê ew bû ku tîrsek li cem xelkê çê be û li encama xwekujiyê bifikirin.

Ji xeynî sedemên han, hin bûyerên din jî çê dibin. Çendîn caran heta niha li Kurdiştana Îranê bûyerên bi vî rengî derketine ku keçek ji aliyê saziyên ewlehî ve tê girtin. Tê gotin ku hêzên navbirî di girtîgehan de deştîrêjîyê dikin ser wan keçan ku bi sedemên siyasî hatine girtin. Ji ber vî jî, hin keçên Kurd piştî ku serbestî tene berdan, dawiyê li jiyana xwe tînin da ku navekî xirab nekeve ser wan.

Hin siyasîyên nêzîkî Mihemedê Xatêmî li Îranê behsa yasayîkirina xwekujiyê kiribûn. Lê berî ku bibe mijara ragihandinê, hate bêtî dengkirin. Li gor wan kesên, di vîyabû kesên ku dixwazin dawiyê li jiyana xwe bînin, sedemên baş ji bo vî biryarê bînin û endamên laşê xwe jî pêşkêş bikin.

Mijarên gerim



N: Ebdûlazîz Qasim

Tirkîyê û Îran, bi bernamêyên cuda û bi mifawergirtin ji lawaziya rola Amerîkî- Ewropayî di krîza Sûriyê de, bûne du dewletên xwedan pêgehên girîng di Sûriyê de.

Piştî serhildana xelkê Sûriyê li dijî diktatoriya Be'is, rejîma Sûriyê dît ku milîsên Îranê û Hizbullah nikarin desthilatdariya wê biparêzin, lewra bi fermî daxwaza piştevaniya leşkerî ji Moskoyê xwest, û di 30'ê Îlona 2015'an de bo yekem car hêzên esmanî yên Rûsyayê dest bi oparasyonên leşkerî di Sûriyê de kir.

Rûsiya piştgiriya rejîma Sûriyê ne tenê li ser asta leşkerî kir, herwisa li ser asta biryarên navdewletî jî kar û xebat ji bo mana rejîmê kir û zêdetirî 9 caran vîto li encûmena ewlekariya NY ji bo berjewendiya rejîmê bikar anî, herwisa ligel Tirkîyê û Îranê hewlên cidî kir ku Aştana bibe alternatîf ji "Cinêvê" re ji bo pûçkirina biryarên navdewletî yên berê derbarê çareserkirina krîza Sûriyê.

Lê niha xuya dibe ku ew hevpeymanîya sêqolî ya derbarê Sûriyê, di navbera Rûsiya û Tirkîyê û Îranê de, ber bi hilûşandinê ve diçe, bi taybetî ku nakokiyên Rûsiya û Tirkîyê li ser Idlibê hene, tevî bêdengiya Rûsiya li hember êrîşên esmanî yên Îsraîlê li ser leşkergehên milîsên Hizbullah û Pasdarên terorîst di nav axa Sûriyê de.

Niha nûkirina rêkêvtina Bercamê û danûstandanên li Vîyenê yên li ser bernamêya navikiya Îranê, mijarek herî gerim ya rojevê ye, ku dibe li ser encamên danûstandinên Vîyenê gelek amadekariyên



nû peyda bibin, nemaze li Sûriyê û Îraqê ku pêgehek mezin ya Îranê di van herdu welatan de heye, tevî ku li gorî dîtin û xwendina piraniya çavdêr û şirovekarên siyasî ku wê ti encamekî van danûstandinên ligel rejîma Îranê nebe, nemaze ku Amerîka heta niha bi awayekî rasterast beşdarî danûstandinên Vîyen nebûye û pêşmercên Îranê nehatine erêkirin.

Li hember lawaziya rola Amerîkî, herî berbiçav ku îro rege hevpeymanîyek Erebi-Îsraîl ketiye rojevê û helwestên cidî li ser zêdexwaziyên Îranê yên navikî û herwisa yên leşkerî di Sûriyê de digire, heta ku Îsraîl li hember danûstandinên Vîyen helwestek cuda ji nerînên Amerîkî û dewletên Ewropî "Birêtaniya, Fransa û Almaniya" heye, û dûr nîne ku Îsraîl bi êrîşên esmanî bernamêya navikiya Îranê wekî heman bernamêyên navikî yên Sûriya û Îraqê ji nav bibe.

Hevpeymanîya Erebi - Îsraîlî, ku netenê hevpeymanîyek leşkerî yan aborî ye, wekî NATO û Shanghai û hevpeymanîyên din, zêdebarê ku heta derbasî mijarên olî jî dibe "ola Îbrahîmî".

Amerîka û herwisa Îsraîl jî pêdagiriyê li ser jinavbirina bernamêya navikî ya Îranê dikin, tevî ku Îsraîl bi ti awayî hebûna Îranê li Sûriyê qebûl nake, ji aliyekê din ku Tirkîyê roj bi roj dikeve di alozî û qeyranên siyasî û aborî yên mezin de, ku nayê qebûlkirin di hevpeymanîya Erebi-Îsraîlî de, tevî têkiliyên wê yên xurt ligel Dubey û hin welatên Erebi, ji aliyekê din ve ku Tirkîyê nikare bibe beşek ji hevpeymanîya deriya Spî "Fransa, Misr, Îsraîl, Qubris, Yonanîstan ..", zêdebarê qeyrana wê ya aborî ku ber bi tunêlek tarî ve diçe.

Jinavbirina bernamêya navikiya Îranê, û lawazkirina pêgeha wê li Sûriyê û Îraqê, wê bi mifayek mezin li tevaya navçeyê vegehe, û goman di wê yekê de nîne ku lawazbûna rola rejîma Îranê û herwisa dîrxiştina Tirkîyê ji hevpeymanî Erebi- Îsraîlê wê bibe faktorekî girîng ji bo çareserkirina pîrsa netewî ya gelê Kurd.




Jinek ciwan ji aliyê birayên xwe ve hate kuştin

Seva Înê 12'ê Sermawezê, jinek a bi navê “Seher Muradî” temen 33 salî, bi lêdana çeqûyan ji aliyê birayên xwe ve li gundê “Baverêz” ê ser bi bajarê Sineyê hate kuştin.

Çavkaniyeke agehder di wê derheqê de bi “Kurdpa”yê Ragihand: “Ew welatiya bi sedema peywendî digel kesek din, ji aliyê birayên xwe ve bi derba çequyan hatiye kuştin.

Herwisa wê çavkaniyê got: “Seher Muradî” dayîka du zarokan e û hevjinê wê du sal berî niha canê xwe ji dest daye.

Herwisa wê çavkaniya agehdar gotiyeku roja Şemî 13'ê



Sermawezê, termê wê welatiyê bi bê birêvebirina rêûresm û sersaxiyê bi axê hatiye spartin.

Wê çavkaniyê di berdewamiyê de got ku heta niha ti kes ji bikujên wê jinê ji aliyê navendên peywendîdar ve nehatine binçavkirin.

Bi piştgirêdan bi amara tomar kirî li Navenda Amar a Saziya Mafê Mirovî ya “Kurdpa”yê, ji 25'ê “November”a sala 2020'an heta 25'ê “November”a sala 2021'an, di gelemper de 38 halletên kuştina jinan li Rojhilata Kurdistanê qewimîne.

Rejîma Îranê bi hêcetên cuda ajelên xelkê zewt dikan

Di bajarê “Dêhloran”ê yê ser bi parêzgeha “Îlam”ê de, karbidestên rejîma Îranê bi hêceta veguhashtina ajelên qaçax hejmarek ji ajelên xelkê zewt kirine.

Roja Înê 3ê Kanûna Pêşîn, li bajarê “Dêhloran”ê yê ser bi Parêzgeha “Îlam”ê hêzên Întizamî yên ser bi rejîma Îranê bi hêceta veguhashtina ajelên qaçax maşînek barhelgir ragirtin ku helgirê 44 ser pez bûye û bi hêceta vê yekê ku ti derfetname an belgeyek bo veguhashtinê tinînin, ajel bi qaçax hesibandine û zewt kirine.

Nirxa wan 44 ser pezên ku ji aliyê hêzên rejîmê ve hatine zewtkirin di bazaera ajelan de zêdetir li miliyardek Tumen e.

Zewtkirina ajelên xelkê ji aliyê hêzên rejîma Îranê bi hêcetên wekî qaçaxkirina ajelan an nebûna belgeyên hewce bo veguhashtinê, tene encamdan, gelek caran hêzên rejîmê wan ajelan



di bazaran de difroşin û wî pereyî wekî xenîmet di navbera xwe de dabeş dikan.


Eva yekem car nîne ku hêzên rejîma Îranê ajelên xelkê zewit dikan û darayiya xelkê ji wan diştin, ew kiryarên rejîmê bûne sedem, kesên ajelan xwedî dikan rastî pirsgerêkên gelek micid bibin û tevî jidestdana darayiya xwe rastî binçavkirin û lêdan û kutanê jî dibin û di dadgehên rejîmê de bêne cezakirin.

Jinek Kurd li bajarê Urmîyê dawî bi jiyana xwe anî

Roja Înê 12'ê Sermawezê, welatiyeka Kurd a bi navê “Kubar Sehet” keça “Xelîl” û rûniştîyê gundê “Girduwan” ê ser bi devera Mirgever a girêdayê bajarê Urmîyê, agir berda xwe û dawî bi jiyana xwe anî.

Pêka gotina çavkaniyek agehdar, ew welatiya bi sedema pirsgerêkên malbatî, xwe şewitandiyê.

“Kubar Sehet”, xîzandar û dayîka sê zarokan e.



Di wê derheqê de roja Pêncşemî 4'ê Sermawezê, Keçek ciwan a bi navê “Jale Shrapeyma” keça “Ebdullah”, temen 20 salî û xelkê gundê “Zêve”yê ser bi devera Mirgever a girêdayê bajarê Urmîyê, agir berda xwe û bi sedema rêjeya zêde ya şewitînê li yek ji nexweşxaneyên bajarê Urmîyê canê xwe ji dest da.

Farqîna kevnar û dîrokî li benda geştiyaran e

Pira Malabadê ya kev-
nar li navçeya Farqînê
ya parêzgeha Amedê ya
Bakurê Kurdistanê yek ji
şûwarên dîrokî yên balkêş e
ku geştiyaran ber bi xwe ve
dikişîne, nemaze cihê xwe
di lîsteya Çanda Cîhanî ya
UNESCO de girtiye. Welatiyên
vê derê niha bang li geştiyaran
dikin da ku serdana vê
navçeyê bikin

Navçeya Farqînê ya ser bi
parêzgeha Amedê, yek ji
navçeyên qedîm û dîrokî
ye li Bakurê Kurdistanê.
Li navçeyê çend şûnwarên
dîrokî hene. Yek ji wan Pira
Malabadê ye ku ji aliyê
Wezareta Geştiyarî û Çandê
ya Tirkîyê ve yek ji 13 pirên
bêhempa ên li Tirkîyê hatiye
deştînişan kirin û di lîsteya
Demkî ya Mîratên Çanda
Cîhanê ya UNESCOyê de
ye. Xelkê navçeyê bo dîtina
şûnwarên dîrokî ên li vê
navçeyê bang li geştiyaran
dikin.

Welatiyê Farqînê Kasım
Turan dibêje “Li Farqînê
mala mêvanan heye, ligel
wê Mizgefta Seleheddîn
Eyubî, Şikeftên Hesûnê,
Kela Zembîlfiros û berhemên



bi vî rengî ên dîrokî hene. Ji xeynî şikeftên Hesûnê Pira me ya ji kevir a Malabadê jî heye ku
li cîhanê wekî wê nînin. Em bang li hemû mirovan dikin ku bîr û berhemên dîrokî û vê pira
dîrokî bibînin.”

Ji xeynî berhemên dîrokî ev navçe bi xwarinên xwe jî navdar e û kebaba cerg bûye yek ji sem-
bolên navçeyê. Hosteyên vê xwaringehê dibêjin gelek kesên ku ji deverên din tînin, xwe birçî
dihêlin daku li vê derê kebaba cergê bixwin.

Hostayê Cergê Ferman Recepoglu got “Ji ber ku cergê nû ye û berxikan e, kesên vê derê diza-
nin bi hezkirin tînin. Gelek kesên nizanin jî li ser pêşniyarê tînin. Ji Enqerê xelk hene ku xwarinê
naxwin bo ku xwe bigehînin vir. Mirov ji Mersîn Edene û Entabê ji bo ku li vir cerg bivixwin
xwe birçî dihêlin. Ji Hekkari, Wanê, Tetwanê Ahlatê û Edilcewazê, tenê ji bo ku li vê derê cerg
bixwin, gelek kes hene ku xwe birçî dihêlin.”

Geştiyar Yahya Bulbul ragihand “Çi dema rêya me bi vê derê bikeve em tînin vê derê. Em bêtî ku
serdana vê derê bikin derbas nabin. Ev der xweştir e, xwarin xweştir tê çêkirin û gelek pajtîr
e. Ji ber wê em vê derê hildibijêrin.”

Navçeya Farqînê di serdemên berê de mîhvandarî bo gelek şariştaniyan kiriye û her yek ji wan
berhemek li navçeyê bicih hêlase. Navçe li cihek stratejîk cih digire û salane hejmareke zêde ya
geştiyaran ji ber dîroka wê ya qedîm serdana wê dikin. Ç: RÛDAW

Di 6 mehan de zêdeyî 14 hezar geştiyaran serdana Muzexaneyê Dersîmê kirin

Li parêzgeha Dersîmê ya
Bakurê Kurdistanê piştî
bi dawî bûna qedexeya Coro-
nayê di 6 mehan de nêzîka
14 hezar geştiyaran serdana
Muzexaneyê Dersîmê kirine.

Li Muzexaneyê Dersîmê
beşên Elewîtî, Arkeolojî,
Pirtûkxane û Etnografyayê
hene û nêzîkî 2 hezar ber-
hemên dîrokî li xwe digre.
Rêveberê Muzexaneyê dibêje
lêkolînên wan ji 2015 û heta
niha berdewam in lê piştî ve-
kirina muzexaneyê ev lêkolîn
hê zêdetir bûne û giringî dane
kolandinên arkeolojîk.

Rêveberê Muzexaneyê Ke-
nan Oncel dibêje “Ji ber
muzexane li navenda bajêr
e û gelek beş lê hene bala
geştiyaran dikişîne. Piştî 1ê
Hezîrana 2021ê ku rewşa

asayî hat ragihandin û heta
niha derdora 13 heza 14
hezar geştiyaran serdana
muzexaneyê kirine. Di dema
pêş de bi îzna Xwedê eger
nexweşiya Coronayê bi giştî
bi dawî bibe dê ev hejmar hê
jî zêdetir bibe.”

Di serî de ji Amed, Xarpêt,
Erzîngan, Çewlig, Izmir,
Enqere, Stenbol û gelek
parêzgehên din ên Tirkîyê û
Bakurê Kurdistanê geştiyar
serdana Muzexaneyê Dêr-
sîmê dikin ku berhemên
dîrokî tê de tînin pêşandan.

Geştiyar Buse Yıldız got “Ci-
hekî xweşe û berhemên ku
mirovan çêkirine bi awayekî
xweşik hatine pêşkêşkirin.
Hem ji me re dibin çavkaniya
hunerê û hem jî pêşan didin
ku mirovên berê çî li jiyana



me zêde kirine û çawa jiyana me asan bûye.”

Mêvanên ku rojane bi armanca geştê xwezayê tînin Dersîmê jî
serdana muzexaneyê dikin û derbarê berhemên de zanyariyan
werdigirin.

Xwendekar Can Aydın diyar kir “Muzexaneyê berhemên
dîrokî hatiye çêkirin, hevalên min pêşniyar kirin. Ez hatim,
bi rastî zanîn û naskirina dîroka xwe tiştêkî gelekî baş e,
pêşniyara min bo hemû kesan ew e ku serdana vir bikin.”

Muzexaneyê Dersîmê ji cihekî girtî yê 4 blok û 5 hezar û 800
metrekare pêk tê û berhemên wek amûrên kevirî, dîzikên bi
axê, berhemên ji madenên cûda hatine çêkirin û peykêrên
şimayê yên rêwresmên bawerîya herêmê tînin pêşandan. Ç:
RÛDAW

Binpêkariyên mafê mirov di Kurdistanê de

Du welatîyên Kurd li bajarê Seqizê hatine binçavkirin

Roja Yekşemî 14`ê Sermawezê, du welatîyên Kurd ên bi navên “Mihemed Fedevî” 23 salî kurê “Ebdullah” û “Rehmetullah Salihiyan Yazîbulaxî” 34 salî kurê “Mihemed” xelkê gundê “Milqerenî”ê ser bi bajarê Seqizê ji aliyê hêzên ewlehî ve hatine binçavkirin.

Ew du welatîyên Kurd bi bê hebûna ti belgeyek yasayî ji aliyê hêzên ewlehî ve hatine binçavkirin û bo ciheke nexuya hatine veguhaştin.

Heya dema belavbûna wê nûçeyê, ji sedema binçavkirin û tohmata ku bi ser wan du welatîyan de hatiye sepandin ti zanyariyek li ber deşt nîne.

Her di wê derheqê de, roja Yekşemî 14`ê Sermawezê, welatîyek Kurd bi navê “Zanko Mes`ûdî” temen 22 salî kurê “Resûl”û xelkê gundê “Milqerenî” ê ser bi bajarê Seqizê ji aliyê hêzên ewlehî ve hate binçavkirin û bo ciheke nexuya hate veguhaştin.

Du welatîyên Kurd ji aliyê hêzên ewlehî ve hatine binçavkirin

Sibêdeha roja Yekşemî 14`ê Sermawezê, du welatîyên Kurd ên bi navên “Se`idî Minberî” 26 salî kurê “Osman” û “Siamek Areng” 26 salî kurê “Yedullah” xelkê gundê “Niyer”ê ser bi bajarê Sineyê ji aliyê hêzên ewlehî ve hatine binçavkirin.

Ew du welatîyên Kurd bi bê hebûna ti belgeyek yasayî ji aliyê hêzên ewlehî ve hatine binçavkirin û bo ciheke nexuya hatine veguhaştin.

Hêzên ewlehî di dema binçavkirina wan du welatîyan de mala wan vekolîne.

Heya dema belavbûna wê nûçeyê ji sedema binçavkirin û tohmata ku bi ser wan du welatîyan de hatiye sepandin ti zanyariyek li ber deşt nîne.

Di wê derheqê de, sibêdeha roja Yekşemî 23`ê Xezelwerê, çar welatîyên Kurd ên bi navên “Areş Minberî” kurê Husêyn, “Zaniyar Minberî”, kurê Emanullah, “Seyvan Minberî” kurê Hişmet û “Mîlad Minberî” kurê Mihemed xelkê gundê “Niyer” ê ser bi bajarê Sineyê ji aliyê hêzên ewlehî ve hatine binçavkirin.

Serbazek Kurd li Urmiyê hate binçavkirin

Roja Yekşemî 7`ê Sermawezê, serbazekî Kurd ê bi navê “Karwan Mihemedî Azer” kurê “Îbrahîm” û xelkê bajarê Mihabadê, ji aliyê hêzên ewlehî ve li bajarê Urmiyê hate binçavkirin.

Pêka gotinên çavkaniyek agehdar, ew welatiye di heyama derbazkirina devreya perwedeya serbaziye de li binkeya Spahê li bajarê Urmiyê bi sedema ve yekê ku bas li pirsên siyasî kiriye, ji aliyê îtla`ata Sipahê ve hatiye binçavkirin.

Herwisa wê çavkaniya agehdar gotiye: “Ew serbaze bo lêpîrsînê bo girtîgeha Îtla`ata Spahê veguhaştine”.

Heya niha lipeyketinên malabata “Karwan Mihemedî Azer” bo agehdar bûn li qedera navbirî bi encam mane.

Newsûd, 2 kolber bi teqeya raşteraşt a hêzên hikûmetê hatine birîndar kirin

Roja Pêncşemî 11ê Sermawezê 2 Kolberên Kurd bi teqeya raşteraşt a hêzên hikûmetê li ser sînore “Newsûd”ê birîndar bûn û bo tedawiya pizîşkî bo navendên tendûristiyê hatine veguhaştin.

Hêzên leşkerî yên ser bi hikûmetê bi bê agehdarkirina berê teqe li komek Kolberan kirine û ew 2 Kolber birîndar kirine.

Pêka çavkaniyek agehdar yek ji wan Kolberên birîndar ji bilindahiyê berbûye û bi dijwarî birîndar bûye.

Heta niha nasnameya wan 2 Kolberan bo “Kurdpayê rohn nebûye.

Ew 2 Kolber piştî wê bûyerê bo çareserîya pizîşkî bo yek ji navendên dermanî hatine veguhaştin.

Agirî

- ◆ Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
- ◆ www.Kurdistanmedia.com
- ◆ www.Agirimedia.org
- ◆ rojnamaagiri@gmail.com
- ◆ www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat:

AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE

E - Mail: Agiri2003@gmail.com

Hejmar (411)



16`ê Sermawez

***Em di wê rojê de rêz ji kêmendamen
di nav refên şoreşê de digirin***